

*KURD BACA
XEWNA XWE
DIDIN*



PEYVA WELAT

Kurd Baca Xewna Xwe Didin

Desteya sernivîs

Ji gava ku welatê kurdan li ser çar dewletan hatiye dabeşkirin heya îro roj êş û azarên kurdan berdwam in.

Rêkeftina Saykis-Bîko gelê kurd ji welatê wî bêpar hişt û Kurdistan li ser çar dewletên ku nû hatin çêkirin dabeş kir, û pê re trajîdiya kurdî dest pê kir.

Ferensa û Birîtaniyayê tawaneke mezin derheqê gelê kurd de kirin dema ku çarenûsa wî bi vî awayê xêz kirin, bêtî ku tu rêz û hurmetê ji vîna vî gelê azadxwaz û berxwedêr re bigirin.

Her çar dewletên ku nexşeya Kurdistanê li wan hate parvekirin, û sînorên wan laşê Kurdistanê û laşê gelê kurd qetqetî kirin, van dewletan netenê erdê kurdan li xwe helal kirin, lêbelê li ser dirêjahiya sed salî dijminatîya gelê kurd û doza wî kirin.

Hişmendiya desthilatdarên her çar dewletan (Turkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê) li ser bingeheke şofînîst û faşîst hate avakirin ku bi ti awayî mafê gelê kurd nas nake û napijirîne.

Li Turkiyê sîstema dewletê li ser hizir û ramanên Atatürk hate avakirin, sîstema ku dibêje dewleta Turkiyê mal û mulkê gelê turk bitenê ye, û heçê ku li ser xaka vî dewletê jîyan dike divê turk be. Ev bîr û bawerî ji bo hemû hêzên desthilatdar yê turkiyê bû êdîyolojiyeke pîroz ku nabe kes nêzîkî wê bibe yan bide guhertin, û di bin vî êdîyolojiya faşîzim de şerê kurdan hate kirin bi behaneya ku kurd cudaxwaz in û dixwazin vî dewletê parçe bikin.

Li Îranê jî, destpêkê ji desthilatdariya şah yê ku bi navê serdestiya netewa farisî şerê kurdan kir û piştre desthilatdariya meleyan ku bi navê olê şerê kurdan kir, lê behane û tohmet heman tohmet bû ku ew jî cudaxwaziya kurdan e.

Li Iraqê û Sûriyê jî rêjîmên netewperist yê erebî yê ku desthilatdariya van her du dewletan kirin bi heman hişmendiya şofînîzm şerê kurdan kirin, li jêr heman behaneyê û heman tohmeta cudaxwaziyê.

Gelê kurd li her çar dewletên dabeşkerên Kurdistanê rastî gelek zor û sitemê hatiye, çimkî wî her dem doza mafê xwe dikir û tekoşîn di ber wî mafê rewa de dikir.

Bi dîtina desthilatdarên her çar dewletan, kurdê çê

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerfina xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

û baş ew e yê ku dev ji nasnameya xwe ya kurdî berde, yê ku dev ji mafê xwe yê netewî berde, yê ku qebûl bike bibe turk, ereb û faris, tûşî vî yekê ew di çavên wan de dimîne kesekî cudaxwaz, xerabker, ajan û xinizkar ku dixwaze welatên wan parçe bike.

Lewra em dibînin her ku kurd li parçeyekî ji parçeyên Kurdistanê nêzîkî bidestxistina mafê xwe dibin, desthilatdarên van her çar dewletan hemû nakokiyên xwe didin hêlekê û hemahengiyê li gel hev dikin da ku wê hewldanê pûç bikin û vala derxin.

Îro li Sûriyê jî em dibînin ku Tirkî, Îran û rêjîma Sûriyê hemahengiyê li gel hev dikin da ku şerê kurdan bikin û destkeftiyên wan ji dest wan derxin.

Dagîrkirina Turkiyê ji Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî re yek ji encamên wê hemahengiyê bû ku nehêlin gelê kurd li Sûriyê bigihên mafê xwe û di pêşeroja Sûriyê de rolekê bilîzin.

Lê dem nema dema berê ye, û kurdan bêhina azadiyê kiriye, û êdî nema dev ji doza xwe berdidin, û ew xewna kurdan ya ku ev dewletên desthilatdar dixwazin wê bikujin êdî roj bi roj geş dibe û nêzîkî rastiye dibe. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



BINGEHA TÊKILIYA SOMERIYAN BI GOTIYAN RE.

Gulal kasanî

Lêkolîner didin zanîn ku şaristaniya Somriyan yek ji wan kevintirîn Jiyana Mirovahiyê ya dîrokî ye, tişta ku vê yekê diçesipîne ew e pîlandinên entîkeyan e. Somerî jî ew in yên yekemîn bingeha şaristaniyê di welatê Mozobotamiyayê de yarim bi yarim danîne ser hev, bajarê Orê jî -li gor baweriyên lêkolîneran -kaniya Horiyan e, yên Impratoriya xwe ya bi hêz li Bakurê Rojhilatê Sûriyayê-Rojavayê Kurdistanê-ava kiribûn, her wiha di dîroka cihanê de jî yek ji wan şaristaniyên herî kevnar e.

Bê guman, rola şaristaniya Somerî di herêmê de bibûye sedemeke giranbûha ji hin xamên bê nuhad û bi kirê re yên ku pênuşa wan hatiye kirîn, dema dinivîsin, van rastiyên dîrokî diguhêrin, ew jî, ji bo vê rolê vegerînin ber bi paş ve ji ber ew kesane dizan in, Somerî koka kurdan in, ev jî ji nerîn û baweriyên nijadperestî ne; Ji ber şaristaniya welatê Rafdeyîn paşî Lehiya Nûh ne cûda ye ji şaristaniyên ku hatine avakirin; Di vekolînên pirtûkên lêkolîner û zaniyarên entîkan de yên ku li ser Somerî û Gotiyan çê bûne, ew di avakirina şaristaniya welatê Mozobotamiyayê de hevbeşeke sereke bûne, çî li bakur û çî jî li başûr, di hin demên dirêj û ji hev dûr de, Lê nîrên bihtirîn ew bûn diguherîna Cugrafi de; bûyrên ji hevdûrketî ku di navbera wan de çê bibûn.

Belko ji bo tayibetmendiya koçberî û veguheştinê, bûye egereke pêwîst û bawer diaramî û niştêcîkirina belabûyî li hin deveran.

Ji berhemên nîrên jiyana rojan e û sedema

suriştiya girêdayî bi pêdiviyên hebûna jiyânê; mîna av û mîrgên çêrê, hiştiye ku ew êl û netewan aram bijiyana û bimîna di van ciyan de.

Ew tîwira ku dibêje " Somerî û Gotî ji yek kok û bintarê ne, yan yek ji wan ji ya din e, di nav lêkolîner û zaniyaran de hîn tête gengeşekirin, lê tuştêk bi balkêş heye û belko ev bibe çareserî ji vê pîrsa aloz re, ew e; di dema dagirkirina Nînewayê, di sala 612 an de B.Z, di nav girûpên Mîdî de Êline ji Maniyî û man -Manda hebûne; Aşûriyan ew di tabolyên nivisandî de bi navê Somriyan tanîne ziman, ev jî di bîra me tîne, zarawa Kurmanj.

Gotiyan di desthilata Someriyana de hevbeş bûn; bi destê 21 key yî; di dirêjahiya 91 salan de; ji nav lîsta şahên Somerî-Akad paşê Aram-Sîn û kurê wî Şar Kalî-Şarî, ev ne lêhatineke -Sidfe- bûye, Ji ber pêwendî ji kevin ve, di nav wan de hebûn.

Ew hevbendiya Mîdî-Babiliyan piştî hezar salî, belko ev jî çespendinek be, ji wê tewirê (Nezeriyê) re, ew tewira dibêje Gotî-Somerî ji yek kok û bintarê ne.

Di dema Lehiyê de Nûh bi Geştâ(beleme) xwe berê xwe da çiyayê Codî; jêdera Gotî-Someriyana, belko zanî bû ew in kalepîrên wî, wek belgenomeyên dîrokî ji aliyên zaniyarên dîroknas ve hatiye wergirtin yên ji jêderên bingehînin yên di pêpelana yekem de xwiya ne, ew jêderên Yonanî ne, wek nivîsînên Kizînfon û Hîrodotis in.

Ew netewên ku dewleta Mîdî damizrandine, gelek sedem û eger hebûn ew digihandine hev, lê sedema herî sereke ew bûye, zordariya dûvdîrêj li ser piyê wan ya ku Ipratoriya Aşûrî li ser wan netew û pêkhatayan bikartanî.

Lê sedemeke din jî hebûye, ew têkilî û pêwendiyên hevjiyanê, ew netewên yek damar û yekîtiya Cugrafi ji yek çarenûs û heyînê hebûn li hember metirsiya beramberî wan. Kiriyarekî navdar hebûye, ew sîstema civakî-abûrî jî, yekgiritina netewên Mîdiyan di dest pêka 4 Hezar sal Beriya Zayînê de cara yekem çê bûye. ■

PAYTEXTA RÛTAN



MEHMÛD HESEN BERAZÎ

şêweyekî wekhev werê pê. Çermo mîna barçemikan, her êvarê derdiket digeriya û bi roj, di quncikên kadîn, keware û şikeftan de diramiya. Çendîn caran xweda gotibû melkemot(esraîl):" Biçe çermo bîne.. ! Lê melkemot piştê ku ji lêgerînê gêj dibû û ew peyda nedikir, vedigeriya cem xwedayê xwe û ji wî re digot: " Tu mêr î..tu biçe peyda bike !.. Xwedayê min; tu bibêjî: min here kêfxweşiyê hemû ji ser rûyê erdê hilîne, cinawiran tev bikuje, lê peydakirina Çermo nehêsan... !!"

Biqasî ku Çermo digeriya, ne bazê birçî, ne jî marê birîndar mîna wî digeriyan û rê û şop dipîvan. Te digot qey pîvandina gerdûn nîvçe maye û ew dixweze kêliyêkê berî ya din, hêjmara dumahîkê bigre destên xwe. Ew baş têngîhîştibû ku comerdî bi dayîne û mêrxwazî bi standîne dibe, lê naxwe wateya van herdu têngehan wê mîna perê çûkan li ber bê bifire.

Bi berbanga sibehê re, wekî rêwiyekî Çermo li ber deriyê Paytextê rawestiyabû. Wî bala xwe dida qarmeyên (kevalên) bilind ku bi tîpên sipî li ser perdeyeke reş hatibûn nivîsandin:" Tu bi xêr hatî bajarê me .. lê veger ...!!" keval, wekî dara sipîndarê ye ziwa ku bayê kurr lêbide, dihejiya lê ketina wê nehêsan bû. Stûnên di bin kevalan de, hemû ji parçeyên candekên mirovan hatibûn pê. Diran, bi serê tiliyan ve, difin bi patikê ve û dev ketibû şûna dil. Jixwe parçeyên din, wekî genim û zîwan têkilî hev bibûn. Her dergevanekî, li şûna şûr, zimanek xistibû nav lepê xwe û pê pêşwaziya mîvanan dikir. Çermo dikir, nedikir wan her şûrên xwe yên çermî liba dikirin û bi ser serê wî de dihejandin. Nedihîştin ew di devê derî re derbas bibe taku qeyid û daxwazên wan bicih bîne.

Dergevan ji Çermo dixwest ku ew hersê erkên seretayî bîne cih, jê şûn ve dakeve nav kolanên paytextê. Ji wan hersê erkan, ya yekem: divê ku niştecihên paytextê rût û tazî bin, ji hemû tiştên ku dest tê hatine

Berî Çermo vejî, dayîka wî digot xwesiya xwe:"Xalojin!...Bixwedê min heftzik zarok, cêwî jî anîn, lê mîna vî zikî netebitî min nedîtin. Ew wekî kurmekî di henava min de dilîze." Ango; Çermo berî werê ser rûyê dinyayê, netebitî bûye. Wekî mirovekî hîn di zikê dayîka xwe de, bi hin tiştan bihisê û tevdîra xwe li gorê wê bigerînê. Piştê ku hinekî Çermo mezin bû, xap û fenên vê dinyayê dîtin, wî gef li heyîna rewşa mirovahiyê dixwarin û jiyanêke azad bê hevrikî, fikir armanc. Çermo, zimanê xwe mîna tevşo dixebitand. Wî şûnewarên kevin dikolandin, hestiyên rizyayî dicivandin û dixwest navên wan jiber bike.

Biqasî wî xwe bi kolandin û vedanê vemijûl dikir, xelkê navê wî kiribûn Çermo. Bi rastî jî, êdî ji xem û derdan ew tenê hestî û çerm mabû. Her ku ew ji vê dinyayê dixerixî, bêzar dibû, yekser bapîrê Nûh dihate bîra wî, xwesteka wî jî dibû avakirina keştiyeke heftper daku xwe bigihîne ezmanê taqê heftan, belkî ji kulên vê dinyayê rizgar bibe.

Çermo, ne tenê xwe deyîndarê zindiyan, wî xwe deyîndarê miriyan jî didît. Ew miriyên wesiyetnema xwe li şûna lînûsê, li ser kehrkê guhên zarokan, li ser kêla kevirîn ya gora xwe berî xatir bixwazin nivîsandibûn. Miriyên ku ji dêvla Şêx û Melleyan, leşgeran ayetên dijûnan li ser xwendibû û di ranavîşa (telqîna) wan de digotin: " Quto û Çomer birayên hev in, ew nizanin li vê dinyayê bijîn, mirin ji wan re zêrê zer e..." Dem bihûrî bû, lê naxwe Çermo dixwest keştiyeke ji ya bapîrê xwe Nûh mezintir saz bike û li ser piştê ramanên nûjen hilfire ezmanan û ji her zayendekî (cinsekî) sê cinawiran têxe nava keştiya xwe, didu ji bo zayendê û yek jî ji bo dadê û vê dinyayê wêran bike. Belkî mirovahî ji nû ve, bi

werdan paqij bin. Ya duyem: divê ku ji tiştên bi candekê mirovan de û guloveriya laş xerab dikin werin birîn, di serî de jî; wekî difin ..guh.. û hwd. Erka sêyemîn, ya ku mirovên li nava paytextê ji mirovên li cîhana din cida dike û bênahiyên wan hûr û kûr dike, daku niştecihên vî bajarî bizanin li ser Merîx û Muşterî çi diqewime, ew e: divê berçavkeke ku tenê li vî bajarî peyda dibe, bide ber çavên xwe. Ev berçavik divê baş were parastin û bi şev û roj were hilgirtin. Herçî ku vê erkê bi cih neyînê, wê ronahiyê ji çavên xwe deyîn bike, lawiran li ser xûna xwe av bide. Berçavik tenê ji heft makerengên sereke du rengan diyar dike; ew jî reş û sor in.

Çermo di nava pêlên ramanan de vedigevizî, hişên wî mîna babelîsaka sêkuçên çiyayên Zagurosê li hev diketin û hev radikişandin. Wî bihayê biryarê kiribû qirika xwe, di dawiyê de, wî kincên xwe mîna kaviîlê marekî ji ser bedena xwe şiqitandin. Jixwe eger te tayek ji pîneyên kincên Çermo bikişanda, wê ew jixweber şilif û tazî bibûya. Wî bi xwe re digot: " Ez di zemanekî şaş de hatime vê dinyayê, helwesta herî hêja ku ez niha bikim, ez e wekî Sokrates, berî ew jehrê bidin min, ez e bi xwe vexum û bila comerdî dîsan ya min be. Ma ne mirovên şareza di çaterêkan de diyar dibin û dibin xwedan biryarên hêja..?!"

Ji bo ku li nava kolanên Paytextê baran bibare, hinek mirovan ji rohilat heya rojava rûn diqijilandin, daku dûman hilfire jor, ewir komî serhev bibin û li ser axa Paytextê zîpik (gijlok) bibarin û laşê niştecihên bajêr gulover bike. Jixwe biraştina pîvazan, xwarina sîran li vî bajarî edet bû, lê çi heyfe!.. kesî bêhna vê yekê nedikir..

Çermo bajar gav bi gav dipîvand, lê ji ber ku her kes bi peywira xwe ve mijûl bû, kesî haya xwe ji wî nebû. Li ber her quncikekî nivîsandibûn: "Qedexe..Qedexe.. Qedexe !.." Ma kengî Çermo li van gotinan guhdar dikir û ev merbend dinasîn. Ew di zikê dayika xwe de nehewiya bû. Wî her dem mîna dizan, di ser û bin berçavika xwe re li hawîr dora xwe mêze dikir. Çav, hemîşe mîna siya Çermo li pê wî digeriyar, rêveçûna Çermo wekî Gayê di nava Gulikan de be, li her derê diyar bû. Xelkê bajêr, ji dûr ve meşa Çermo dinasîn û bi kustepistan digotin hev: " Xeşîme

ha !..Here keko here..Axetî bi şorba sar nabe.." Û dibû tiqetîqa kenê wan. Piştê ku Çermo ji wan dibûrî, li pê wî digotin: " Qey ev nizanê..! Yê ku gû dixwê, kevçî di ber tengê xwe re dikê?!"

Hîn Çermao kêvjik ji ser çavên xwe venedabûn, du mirovên bê ziman, bi zor şûna guhên wan mîna koka kerengên payîzê ku kurmikan xizînge li ser civandibe diyar dibû, bi çepelên Çermo girtin û ew birin. Berevaniya Çermo tenê bi awirên çavan bû, lê wan mirovan qet haje awirên wî nebûn, ji ber ku mertala wan kezêba reş û tiliyên wan jî, beşên diranan bûn. Her ku Çermo xwe radigirt, wan şûrên xwe ye çermî carekê bi patika wî re dixuşandin, dor guhên wî sor û mor dikirin. Çermo gihîştibû wê baweriyê, divê ku biçe.. Lê ber bikur ve biçe ?.. Dawî hîn mîna şevên çelê zivistanê ne diyar bû, ne dûr e ku heya şefaqê çel carî bibe ewir û çelî jî bibe sayî.

Çawa ku Çermo di devê deriyê şaneşînê re derbasî nava koçika mezin bû, çavên wî yekser beziyan ser kevalan bi dîwêr ve hilawestî. Li ser kevalan bi tîpên stûr nivîsandibûn: " Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe...Ji buhuştê wê de cih nîn e, ji dûjehê wê de rê nîn e.. û hwd." Bi çendîn tabloyên mezin eywan hatibû xemlandin. Mirov digot qey ev roja haşer maşerê ye, ji mezinan pir û ji çûkan hindik wê were xwestin.

Çermo, li pêş dadweran rawestiyabû, çavên wî di tasa serê wî de direqisîn. Her kêliyêkê, wî careke din di ser û bin berçavika xwe re li wêneyên ku li ser dîwarê salonê hatibûn niqîşandin dinêrî, pêre zirava wî diqetî. Salon ji wêneyên Maran, Dimûşikan, Guran, Şêr û Rûviyan hatibû miştkirin. Lê tiştê ku bala Çermo zêde dikişand ser xwe; çima her roj ev mîlet hemû rût û repal in, çima îro her kes mîna Mellayên ku wê herin xwe têxin nava şeltê (nivînan), her yekî çend hirin paçê sipî bi ser laşê xwe yî rût de berdaye ?? Çima hemû mirov bi xasê gewir û sipî hatine niximandin, tenê hersê dadwer bi kincên reş in ?? Her çende ku îro hinekî cêwazî ji aliyê ruxsar ve heye, dîsan jî her kes bi heman berçavikê bûn.

Berî dadwer dadgehê vekê, wî nasnameya Çermo xwend û ji wî pirsî: Navê te Çermo ye ?..Bavê te Xemo ye ?..Dayîka te Şemlê ye?..Cihê jidayîkbûna

te Mereser e?...Sala jidayîkbûna te hîn nehatiye nasîn !..Çermo bi peyivên dadwer re tenê lêva xwe ye jêrîn dihejand. Lê dadwer pirsên xwe mîna guloka rîsîn ji hev vedireşand û pêve diçû û digot: " Gunehê Te Meraq e!?" Danaşîn hîn bi dawî nebibû, kustepist di nava rûniştîyan de didomiya. Dadwer, mafê axaftinê mîna noka ku li tehtê bikeve, belav kir. Dengsalon dihejand, zimezim ji nava wan radibû, hemû deng wekî serê Leglegan li nav hev digeriyan. Dadwer şaşûmaşî bibû, ka wê ji kê re bibêje: "fermo"! ...Hema dadwer bigota: " Tu " wê deh mirov rabûna ser piyan, jixwe her kesî ji qehran re xasê sipî ji ser laşê xwe avêtibû, mîna tiliyên dadwer rût û repal dixuyan. Yekî ji wan mirovan hilda xwe û bi devekî tijî got:

" Em kayê têxin postê Çermo !"

Ew hîn rûneniştibû, yekî din rabû ser piyan û digot:

" Em xûna wî bikin sorînge û li eniya mirovên wekî wî bidin !"

Çawa ku kesê sêyemîn bê destûra dadwer, ji nişkan ve rabû ser xwe, hema pêre gotin ji devê wî firiya û got:

" Naaa... ya baş em ji hestiyên wî darcigaran çêbikin, çermê wî jî, ji bo dahola me pêwist e..!"

“(Tayek ji mûyê qûna Berêz jî, ji me re qazinceke mezin e..)”

Di dumahîkê de, dadwer hêz û bandora xwe bikar anî û biryara dadgehê xwend: " Divê ku Çermo qet ti caran nebêje NA... û di ser berçavika xwe re li hawîdora xwe nenêre.. lê naxwe, wê ji laşê wî parçê mezin guh bimînê.." Lê, rûniştîyan digotin: " Naaa..Em wî bavêjin pişt çiyayê Qaf, bila tenê li vê dinyayê ew çavên xwe biçêrîne û kêçan li ser piştê xwe kedî bike..."

Çermo baş dizanî ne di heyama xwe de hatî ye dinyayê, lê disan jî wî digot:" Ma ne ez şût û rût hatim dinyayê, bila rût û şût jî biçim.. Bila gunehê min bibe meraqa her kesî.. em tev mîvanê jiyanê ne.... ■





PÊŞKETIN Û BELAVBÛNA ZIMAN

Imran Yûsiv

Ziman mîna heyîneke zindî ye, lê pêş dikeve, mezin dibe, tê guhertin, û dibe ku bimire jî. Gelek faktor hene ku beşdariyê di pêşketin û belavbûna ziman de dikin, em dikarin giringtirîn faktorên pêşketin û belavkirina ziman bi van çend faktorên destnîşan bikin:

1-Veguheştina ziman ji nifşekî ta nifşekî.

2-Bandorbûna ziman bi zimanên dîtir.

3-Faktorên civakî, derûnî û cografî. Mîna şaristaniya gel, sîstema wî ya civakî, adet, ayîn, kultor, folklor, kevneşopî û bîr û baweriyên wî, çanda wî, hizir û ramanên wî, hest û aliyê wijdanî, jîngeha cografîk H.w.d.

4-Faktorên wêjeyî: mîna berhemên ku axvînerên vî zimanî diafirînin, karê ku peymangehên hînbûnê û komcivînen zimanî dikin ji bo parastina ziman, pêşxistina wî û parastina reseniya wî.

Hemû zimanên mirovî di pêşketin û belavbûna xwe de ne wekhev in, û ji vê hêlê ve cudahiyeke mezin û diyar di navbera wan de heye. hin ziman derfet ji wan re peyda bû ku bi rengekî berfireh belav bibin û jimareke mezin ji mirovan bi wan biaxivin, mîna zimanên latînî û erebî di serdemên ortê de, û zimanên ingilîzî, ferensî û ispanî di serdemên nû de. hin ziman jî di çarçoveyê cografî ya teng de man û jimareke hindik ji mirovan bi wan diaxivin, lewra hin ji van zimanan di bin gefa jinabirinê de dijîn. Beşek din heye ku di wê ortê de maye, anglo ne belav dibe û ne jî li pêş dikeve mîna zimanê farisî.

Gelek sedem jî hene ku guhertinên mezin di ziman de çêdikin û dihêlin ku gelek zarav ji wî zimanî bîne vedan. Ev jî vedigere asta xurtbûn û belavbûna wî zimanî, her weha faktorên civakî, siyasî, cografî, saykolojî û xeynî wan jî dibin sedema vê rewşê.

Cudahiyeke diyar di ristina axaftinê de di navbera zimanan de heye, ev ristin girêdayî hin rêbaz û zagonên destnîşankirî ne ku di jîngeha ziman ya taybet te hatine pejirandin û bikaranîn. Ango tiştê ku ji zimanekî re dibe, dibe ku ji zimanekî din re nebe, û tiştê ku di zimanekî de ciwan û xweşik tê xuyakirin, dibe ku di zimanekî din de wiha neyê xuyakirin û nexweşik be.

Zimanê nivîskî di pêşketina xwe de rêyeke cuda ji zimanê

axaftinê digire, û bi demê re dûrahî di navbera wan de mezin dibe heya ku her yek ji wan ji yê dîtir cihê dibe. Her weha zimanê nivîskî li ser gelek beşên têvel belav dibe, ew jî li gorî hunerên gotinê yên ku bi kar tîne, û li gorî her yekê ji van huneran, mîna helbest, bexşaneya wêjeyî, gotar, nivîsa zanyarî. Û ji ber têvîlbûna her hunerkê ji van huneran ji hêla xwezaya xwe, mebestên xwe, têkildariya xwe bi aliyê wijdanî û têgiştinî ve û şopandina gel jê re û bandora wî li ser derûna gel, û qasiya çalakbûna kesên ku tê de kar dikin, û qasiya afirandina têgînan tê de, û derbaskirina şêwazan, û tiştê ku ji zimanên biyan werdigirin ji gotin û hiziran ...h.w.d.

Eger ziman li gorî faktorên ferehbûnê û tengbûnê belav dibin an jî di çarçoveyê teng de dimînin wekî ku ew sîmayêke şaristanî ji xwediyên xwe re ye û pêvanek ji pêşketina wan re ye, ew ziman bi xwe û di xweseriya xwe de bi rengekî navxweyî jî mezin û biçûk dibe jî. Hin Bêje û têşeyên wî dimirin û namînin, û hin bêjene din tene afirandin, û hin jî çalak dibin, û beşê sêyem ji zimanên din tene anîn, û dibe ku ev yek guhertinekê di têşeyên wê de bikin, ev jî ji encama têkiliya wî û bandora wî bi zimanên dîtir e.

Her pêşketineke zanistî û teknîkî ya nû bêje û têgînin nû dixê zimanê civakê, û dibe ku ew bêje û têgîn netenê di zimanê welatekî de cihê xwe bigirin, lêbelê di gelek zimanên cihanê de bîne bikaranîn. Wek mînak: (Îdyoljî- Impiryalîzm- kompyuter- Enternê- Televizyon - Radyo- robot... h.w.d)

Wek ku me di destpêkê de gotibû, ziman heyîneke zindî ye, mezin dibe, li pêş dikeve û hinek ji zimana dimirin û namînin. Gelek ziman wenda bûne û kesek tiştê li ser wan nizane, kesek nema wan bi kar tîne.

Di heman demê de jî gelek bêje û têgînen nû bi rengekî berdewam derbasî ziman dibin, li gorî pêşketina civakî, zanistî û teknoloji. ■

في الفلم تسكب البطلة القهوة سهوا على أرض إحدى المقاهي بسبب طفلتها و حينها تكون ردة فعل الحضور قاسية مليئة بالاشمئزاز من الأم و يتهايمسون لبعضهم البعض بأنها صرصور و هو مصطلح يشير إلى الأمهات اللائي يفتقرن إلى الأخلاق و التصرف اللائق في المقاهي و الأماكن العامة لدرجة أن بعض المقاهي و المطاعم العصرية منعت هؤلاء النسوة من دخولها.

الحركة العالمية-

شهدت الرواية تجاوبا عالميا. وبحسب الناشر الكوري الجنوبي مينومسا، أصبح الكتاب من أكثر الكتب مبيعا في اليابان والصين وتايوان المجاورة. تم بيع حقوق النشر إلى 71 دولة من بينها المملكة المتحدة والولايات المتحدة وفرنسا وإسبانيا. تقول «جيمي تشانغ»، الأستاذة في جامعة «إيوا ومانز» التي ترجمت الكتاب لسوق المملكة المتحدة، بأن الرواية عمل عاطفي صعب. حيث تحتم علي مواجهة الكثير من المواقف التي تحوي قدر كبيرا من الكراهية المبطنة للنساء في هذه الرواية عند ترجمتها. «و وجدت نفسي أسأل بطلة الرواية «كيم جي يونغ»، «لماذا لا تدافعين عن نفسك و تواجهين هذا الكره؟ و «لماذا لا تقولين شيئا حيال ذلك؟»

تتابع المترجمة: «أدركت لاحقا بأن صراع «كيم جي يونغ» يأتي التناقض الحاصل لفترة طويلة جدا بين ما كان يقال للمرأة حينها بأن هناك مساواة بين الجنسين و إن بمقدور المرأة فعل ما تريد و بين نظرة المجتمع و تعامله الحقيقي للمرأة الذي لم يتغير.» و تعتقد «تشانغ» أن الكتاب لاقى صدا و ترحيبا في الثقافات الغربية لأن المشاكل التي واجهتها بطلة الرواية في كوريا الجنوبية تماثل المشكلات التي تواجهها المرأة في المجتمعات الغربية إلى حد ما من تفضيل للذكور على النساء و التمييز بينهم على أساس الرواتب و الوظائف أيضا و إن كان بدرجة أقل.»

يضيف البروفيسور «لي»: «الكتاب ليس عن امرأة محددة بذاتها بل يشير إلى شريحة كبيرة من النساء الكوريات اللواتي مررن بنفس ظروف بطلة الرواية و ذقن مرارة العنف و الاقصاء و التمييز ذاتها.»

يتابع البروفيسور قائلا: «إن الحركة النسوية في كوريا الجنوبية بعد مقتل فتاة «كاكنام» كانت تقودها «نساء عاديات» و قال «بأن هؤلاء النسوة لم تكن ناشطات في مجال حقوق المرأة ولكنهن كن ببساطة نساء تعاطفن مع الضحية». «ففي البداية حزن عليها. ثم وضعن أنفسهن موضع الضحية، و بالتالي أدركن بأنهن معرضات لنفس هذا الموقف أيضا. وعندها أدرك النسوة الرابط بين مصدر خوفهن و سبب التمييز الذي يعانين منه. هنالك أعلن بأنهن لن يقفن مكتوفات الأيدي بعد الآن. يقول البروفيسور لي بأن الرواية ضربت على وتر أوجاع النسوة الكوريات على اختلاف أعمارهن و فئاتهن العمرية. فالجيل الأخير من الفتيات الكوريات اللائي هن في عمر بطلة الرواية «كيم جي يونغ» هن من الجيل الذي قيل لهم بأنهن يستطعن فعل ما يشئن. لذلك نشأن و هن يدرسن بجد و عملن بمثابة و تجاهلن أوقات الترفيه لكنهن اصطدمن بحقيقة الواقع المغاير حينما وصلن للحياة المهنية. ففي الواقع المهني تكسب النساء الكوريات حوالي 36 بالمئة من رواتب الرجال! حيث صنفت مجلة الإيكونوميست كوريا الجنوبية على أنها أسوأ دولة متقدمة في معاملة المرأة العاملة. وفي السياق نفسه و الذي يعكس العقلية الكورية الذكورية لشريحة كبيرة من الذكور في المجتمع الكوري، قام «جيونغ كاب يون» و هو مشرّع محافظ، بإفحام المرشحة «جوه سونغ-ووك»، في جلسة استماع تأكيد ترشحها لرئاسة «لجنة الممارسات التجارية المشروعة».

حين سألتها عن سبب عدم زواجها أو إنجابها للأطفال، قائلاً إنها فشلت في «المساهمة في التنمية الوطنية» بسبب ذلك التصرف.

سلطت الرواية الضوء أيضا على التمييز المجحف الذي يواجهه المرأة عندما تختار الإنجاب. ففي إحدى المشاهد

الرواية أداة تشرية و درب للتغيير

هيونغ أون كيم

ترجمة و تقديم: محمد رمضان

كتب

الروائي و الناقد الكردي السوري هيثم حسين:

«حين يكتب الروائي بصدق وجرأة عن واقعه ومجتمعه فإنه يساهم في فضح القمع والجهل فيه، ويخفف من حدة القهر والتخلف المتفشين بين ثناياه.. الرواية أداة لتشريح المجتمعات وإحدى الدروب للتخلص من رواسب الأفكار البائدة المتراكمة التي ما تزال نشطة وفاعلة بطرق مختلفة.»

تنطبق مقولة الكاتب و الناقد هيثم حسين على كتاب الروائية الكورية الجنوبية «كيم جي يونغ»، من مواليد 1981م والتي تعالج فيه نظرة المجتمع الكوري الجنوبي للمرأة الكورية و ما تلا ذلك من ردات فعل على الكتاب و لاحقاً على الفلم الذي تم انتاجه و اقتباسه من ذات الرواية.

أدى الكتاب الذي أحدث هزة في المجتمع الكوري إلى عقد العديد من المناقشات المتأخرة حول النسوية وحقوق المرأة في البلاد في مجالات تتراوح من السياسة إلى الترفيه..

اعتبر الكتاب إلى جانب الفلم المأخوذ عنه على أنه رمز للنضال ضد التحيز الجنسي في البلاد.

حيث أشعل معركة شرسة ضد التمييز الجنسي في كوريا الجنوبية، و وصلت مبيعات نسخ الرواية سنة 2016 إلى أكثر من مليون نسخة

قصة الرواية:

يروى الكتاب قصة امرأة كورية عادية في الثلاثينات من عمرها و التي تقضي وقتها بين العمل و البيت و مواجهتها للتمييز الجنسي في كل مرحلة من مراحل حياتها.

كيم جي يونغ» اسم بطلة الرواية هو واحد من أكثر الأسماء الكورية شيوعاً في فترة الثمانينات، وبالتالي يمثل هذا الاسم المرأة الكورية بشكل عام. يحكي الكتاب، الذي كتبه «تشو نام جو»، و التي هي كاتبة سيناريو تلفزيونية أيضاً، عن

قصتها من الولادة إلى الأمومة من منظور طبيعتها النفسي. فحينما ولدت بطلة القصة «كيم جي يونغ»، في عائلة أبوية نموذجية، تعتذر والدتها لحمايتها لإنها وضعتها أنثى و ليس الذكر في المجتمع الكوري الجنوبي كالأنثى.

تواجه «كيم» في كل مرحلة من مراحل حياتها من المدرسة، مروراً بزواجها وصولاً إلى حصولها على عمل، تواجه «كيم» تمييزاً عميقاً و تحيزاً صارخاً ضد الأنثى في المجتمع الكوري الجنوبي، كما تصوره الكاتبة. فعلى الرغم من أن كوريا الجنوبية هي من الناحية الاقتصادية واحدة من أكثر الدول تقدماً في آسيا، إلا أنها تظل من أكثر المجتمعات تحفظاً لدرجة أن المطربات والممثلات اللائي صرحن بأنهن قد قرأن الرواية تعرضن للهجوم والمضايقة عبر الإنترنت. حيث يقول أولئك الذين ينتقدون الكتاب أنه يقدم وجهات نظر مشوهة، غير موضوعية، و ينشر التعميمات الجنسية السلبية ضد الرجال.

و يضيفون بأن الرواية تصور الشخصيات الذكورية على أنها تدعم بشكل نشط و مباشر و غير مباشر أيضاً ثقافة التمييز ضد المرأة و يجادل النقاد أيضاً بأن الرواية تفاقم الصراعات بين الجنسين.

و تأججت التوترات في المجتمع الكوري مرة أخرى عندما تم الإعلان عن الفيلم لأول مرة بعد صدور الرواية بثلاث سنوات حيث تلقت الممثلة الكورية «جونغ يومي» التي مثلت دور بطلة الرواية خلال يوم واحد فقط آلاف التعليقات المسيئة و التي تحض على الكراهية على حسابها على منصة انستغرام.

و قام المعارضون بتقديم عريضة تطالب رئيس البلاد بعدم سماح عرض الفلم. بالإضافة إلى زيارة آلاف الكوريين المعارضين للفلم موقع نشر الفلم و أعطوا تقييمات سيئة له حتى قبل إصداره و عرضه!

التمييز والإقصاء والعنف-

ورداً على سؤال حول سبب رواج الرواية بقوة لدى النساء الكوريات، قال «لي نا يونغ» أستاذ علم الاجتماع بجامعة «تشونج أنج» في سيول «لبي بي سي» إن «توقيت الرواية لعب دوراً رائعاً في رواجها.»

فقبل صدور الرواية ببضعة شهور هزت حادثة مقتل شابة بالقرب من محطة مترو «كاكنام» في «سيؤل» المجتمع الكوري خاصة بعد أن أدلى القاتل بشهادته عن سبب قتله للفتاة قائلاً: «أنه قتل الفتاة بسبب معاناته الطويلة من تجاهل النساء له و لم يعد يتحمل ذلك فقام بارتكاب الجريمة بحق الفتاة» هذه الحادثة بالذات إلى جانب اتهامات العنف الجنسي التي طالت شخصيات كبيرة في الأدب و الصناعة الترفيهية.

اشعلت حركة #ootem و التي تعني (تم الاعتداء علي أيضاً)


PERTEW BEGÊ HEKARÎ

Profesor Qenatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê (Tarîxa Edebiyata Kurdî) de dibêje ku gelek zanyarî derbarê jiyana vî helbestvan û wêjevanê kurd de nînin. Û dibêje ku di sala 1976an de zanyarê kurd Sadiq Behadîn dîwana Pertew Begê Hekarî çap kiriye.

Sadiq Behadîn di pêşgotina dîwana Pertew- Beg de dibêje ku dîrokna û wêjenasên kurd tiştê zelal û ronî drheqê Pertew- Beg de nenivîsîne, lê tiştê ku hatiye nivîsîn tenê ew e ku wî dîwana xwe di sala 1221ê koçî, 1802ê zayînî de nivîsiye. Û dibêje ku cara pêşî hin helbestên Pertew- Beg di hejmarên 3,4 û 5em ji kovara (Dengê Gitî Teze) de di sala 1944an de hatine weşandin.

Bi gotina Sadiq Behadîn, helbestên Pertew- Beg di pirtûka (Dîwana Kurmanî) de hatine çapkirin. Her weha sê-çar xweşxane û helbestên wî di kovara (Nûserên Kurd) de di sala 1971an de hatine çapkirin.

Sadiq Behadîn derbarê jiyana Pertew-Beg de dibêje ku li gorî fikira min ew ji binemala mîrê Hekariyê bûye, lewra ew bi navê Şa-Pertew navdar e. Ji mala camêr û xweşmêran e, û



di nav malbateke xêrxwaz û payebilind de ji dayik bûye û mezin bûye.

Warê ku lê mezin bûye, xwezayêke pir ciwan û bedew bûye, cihê çiya, deşt, gol, havîngeh û zozanan bûye. Her weha cîwarê zanist û wêjeya klasîk a kurdî bûye.

Li wê deverê gelek zana, rewşenbîr û wêjevanên kurd rabûne, bi taybetî di navbera sedslaiyên ji 14 heya 19an de, mîna Elî Herîrî, Feqê Teyran, Melalê Batê, Ehmedê Xanî û gelek din.

Sadiq Behadîn dibêje ku Pertew Begê Hekarî yek ji şagirtên Melayê Cizîrî bûye, û ew şagirtêkî pir jîr û çalak bûye. Û li ser rêça seydayê xwe helbest saz kirine.

Ji nav helbestên Pertew Begê Hekarî, me ev parçe helbest ji xwînerên xwe re bijart:

Dil ji min bir

Wê ji nû cezba evînê, dil ji min bir, dil ji min

Eşweyek wê hor eynê, dil ji min bir, dil ji min

Agirê hubê bihetim, dil kire mislê kebab

Bi avran wê sur şîrînê, dil ji min bir, dil ji min

Sebir û aramek nema min her wekî li dêmê semek

Dûriya wê nazenînê, dil ji min bir, dil ji min ■

FERHENGOK

geşt	رحلة
havîngeh	مصيف
seyran	رحلة ترفيهية
bêhinvedan	استراحة
serdan	زيارة
Pêşwazî kirin	استقبال - ترحيب
navber	فاصل
ger	جولة
Xweza-sirişt	طبيعة
derya	بحر
berav	شاطئ
kendav	خليج
Çol-bejahî	برية
gol	بحيرة
melevanî	سباحة
Nêçîr kirin	اصطياد
pêl	موج
konvedan	تخييم
Daristan	غابة
gundewar	ريف





تنمة المقال: ما تأثير قانون قيصر على مناطق الادارة الذاتية في شمال شرق سوريا ؟

غير مسبقة.

أما عن مناطق شمال شرق سوريا و التي أعلنت أمريكيا مراراً بأنها ستكون مستثنية من هذه العقوبات كما قال المستشار الأمريكي الخاص لقوات التحالف روباك أن واشنطن ستمول مناطق "الإدارة الذاتية" لاجتياز أزمة فيروس "كورونا"، عقب اجتماع مع ممثلي من "الإدارة الذاتية" في مدينتي عين العرب كوباني ومنبج، عبر دائرة اتصال إنترنت.

حول قانون قيصر و تأثير العقوبات على مناطق الادارة الذاتية في شمال و شرق سوريا استطلعنا آراء بعض المواطنين و أعددنا هذا التقرير.

المواطن محمد حسين و هو عامل يعمل بأجر يومي تحدث لمجلة ولات عن تأثيره بقانون قيصر قائلاً: «نحن نمر بظروف معيشية صعبة تزامنا مع دخول قانون قيصر حيز التنفيذ وانهيار العملة السورية، فالاسعار في الاسواق ارتفعت بشكل جنوني وفي المقابل لا يوجد فرص العمل الآن بسبب ارتفاع الاسعار .

و أضاف حسين قائلا بأن قانون قيصر لن يؤثر على النظام بقدر ما يؤثر على الشعب، وعلى الرغم من وعود أمريكا بان مناطقنا لن تتأثر بهذا القانون لكننا نشهد عكس ذلك اليوم واذا ما استمر هذا القانون بدون حلول فأن سيؤدي الى حدوث مجاعة في مناطقنا.

المواطن علي أبراهيم و هو موظف لدى الدولة تحدث لمجلة ولات عن معاناته في ظل قانون قيصر و قال :

نحن نعاني من الفقر قبل تطبيق قانون قيصر، وكان راتبنا قبل القانون يعادل ٠٤ دولارا والآن هو لا يساوي ٥٢ دولارا اي انك لاتستطيع ان تعيش بهذا الراتب سوى لبضعة ايام فقط، أعتقد أن هذا القانون دمار للشعب السوري و المواطن لم يعد يستطيع ان يعيش في هذا البلد، نحن أصبحنا تحت خط الفقر بكثير، و لا نملك إلا ان ندعي بأن يأتي الفرج قبل أن نموت جوعا. ■

ما تأثير قانون قيصر على مناطق الادارة الذاتية في شمال شرق سوريا ؟



أفسان كردي

قانونُ قيصر لحماية المدنيين في سوريا هو اسمٌ للعديد من مشاريع القوانين المقترحة من الحزبين في الكونغرس الأمريكي موجّهة ضد الحكومة السورية... سُمّي مشروع القانون باسم قيصر نسبةً لشخص مجهول قيل أنّه سرّب معلومات وصور لضحايا «تعذيب» في سوريا بين عامي ١١٠٢ و ٤١٠٢.

دخل قانون قيصر حيز التنفيذ في ٢٠٢/٦/٦١ ليضع الاقتصاد السوري أمام حلقة جديدة من الضغوطات وهو الاقتصاد المدمر أصلاً جراء الحرب الدائرة و المستمرة منذ ٩ سنوات..

الكونغرس الأمريكي بمجلسيه الشيوخ والنواب، أقر القانون في ١١ ديسمبر / كانون أول ٩١٠٢، بهدف معاقبة النظام السوري ورئيسه بشار الأسد، على ما تقول واشنطن إنها جرائم حرب ارتكبتها بحق المدنيين.

وبينما يخضع النظام السوري بالفعل، منذ سنوات، لعقوبات أمريكية وأوروبية، إلا أنها بقيت محدودة ولم تطل كيانات ودول خارجية مرتبطة بالنظام و داعمة له، فيما نص «قانون قيصر» على فرض عقوبات على الأفراد والكيانات وحتى الدول التي تدعم نظام الأسد.

ليزيد هذا القانون من مآسي الشعب السوري حيث أدى الى انهيار كبير للعملة السورية مقابل الدولار ليتجاوز الألفان وخمسمئة ليرة سورية وارتفاع جنوني في أسعار السلع والمواد الغذائية ليتسبب بموجة غلاء

بعد عشر سنوات من الثورة السورية وعدم تخلي النظام السوري عن استخدام آلة الحرب لقمع المعارضين لنظامه أو الدخول في مفاوضات مباشرة مع المعارضة لوضع دستور جديد للبلاد وأصراره على هدر المزيد من دماء السوريين وبعد عجز الدول الداعمة عن إيجاد حل سياسي للمسألة السورية وفق قرارات الأمم المتحدة، أعلنت واشنطن عن فرض حزمة من العقوبات الاقتصادية على النظام السوري والداعمين له و كان آخرها قانون حماية المدنيين أو مايسمى بقانون قيصر.



LEYLA REŞO

Leyla Reşo : “Helbestvan Wijdanê Gelê Xwe Ye”

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

Leyla Reşo, di sala 1979 an’ de li bajarê Heseke yê rojavayê Kurdistanê jidayik bûye, derçûya peymangeha amadekirina mamosteyan e, helbesta nûjen dinivîse, niha li bajarê Heseke mamosteya zimanê kurdî ye.

-Kengî û çawa te dest bi nivîsandina helbestê kiriye, derbarê wan destpêkan de tu çi dikarî ji me re bibêjî ?

Di temenê 14 de salîya xwe de min dest bi nivîsaandina helbestê kir lê belê bi ziman Erebi bû, lê dema min bi kurdî nivîsand ewçax temenê min 18 de sal bû, di nivîsa helbesta kurdî de ez bi bavê xwe bandor bûm, çimkî wî helbest dinivîsand û bû sedema berdewamiya vê hunerê di malbata me de.

Helbest ji bo te çi wateyê dide ?

Helbest ew gotin û peyvên ku li hevdûhatî ne, û bi bêjeyên hunerî û gotinên wêjeyî xemilandî ye, mirov tê de dikare her hestî diyar bike, bê sînor û bêtî ku têkeve xem û

nebaweriyan, helbest dengê wijdanê mirov e yê ku weke zengil lê dide himber zor û astengiya jiyanê û kêf û xweşbûna cîhanê.

Helbestvan ji kê re helbestên xwe dirêse ?

Helbestvan wijdanê gelê xwe ye, her ew pênuşa xwe ji bo gelê xwe bi kar tîne, kul û derdê wî tîne ser ziman û çareseriyan ji wan re dibîne. Her ew bi êşa welatê xwe xembar e. Hest û helbestên wî mîna tivingekê di sînga dijminan de ye.



Helbest çi ji jina helbestvan re dibêje, û jina helbestvan çi dikare dide helbestê?

Helbestji jina helbestvare dibêje berevaniyê di ber hest û pê ûsa xwe de bike. dibêje bera tu kelem û astengî nekve navber te û helbestê de, ji ber ku helbest dikare li kêleka te raweste û mafê te biparêze.

Jina helbestvan bi her hest û peyendiyên xwe bi helbestê re heval e dema dibîne ku helbest mîna çiyakî li milê wê ye, ew ê her di dadgeha jiyane de pê re heval be, ji bilî ku ew ê helbesta xwe bibîne weke hêzeke ku karibe nêrînên şaş di civakê de biguherîne.

Di navbera helbesta rêzbend û ya nûjen de, Leyla Reşo ji kîjanê bêtir hez dike û çima?

Herdû awa xweşbûnek wan ya taybet heye.

Helbesta rêzbend ya bi pîvana kiteyan û terezoya xwe û mûzîka wê ya pir xweş li ser guh pir hestekî xweş li bal min çêdike, bêtir kar tê de heye û ristekê xweş di nava gotin û wateyan de çêdike. pirê caran ez wan dinivîsînim, pê re dîroka hezarê salan û bîranînên xweş di bîra xwe de tînim, ew ji rihê hest û hizran derdikeve.

Helbesta nûjen jî xweşbûnek wê heye, çi ji milê ku ew bêsînor tê nivisandin û berê wê pir fireh e ji bilî ku ew bi awayekî hunerî û hîlbijartina gotinên wêjeyî tê nivîsîn, û çi li milê azadiya wê ya ji hêla hevok û gotinan be.

Em dikarin bibêjin ku her yek ji wan xwedî teybetiyên cuda ne, lê rihekî xweş di hundirê wan de dilîze.

-Di nivîsandina helbestê de, tu bêtir giraniyê didî çi, mijarê yan aliyê hunerî
Li bal min herdû giring in, û ez wan bi

kar tînim, ji ber ku helbest ne xwedî mijar be wê pûç be û bêwate be, awayên hunerî mîna cilên bûkan in wê dixemilînin û rihekî bedew dixin hundirê wê de.

Heya niha çi berhemên te yên helbestê hene ?

Du pirtûkên min hene, yek çapkirî ye, navnîşana wê "Tava Hêviyan" e, û yek li ber çapê ye ku navnîşana wê "Kevana Rengan"

Min dixwest ku ez ya sêyem jî bi dawî bikim, lê derfetên baş bi min re çênebûn.

Ji bilî helbestê, gelo hewldanên te yên nivîsê hene ?

Berî niha di demên derbasbûyî de hinkî meraqê min di nivisandina çîrokê de hebû, her weha hewldanên min ên wênekêşiyê jî hebûn lê bi min di wan de berdewam nekir.

ji bo pêşerojê çi projeyên te yên nivîsê hene?

ji bo pêşerojê geleke mijar di mejiyên min de dilîzin ji bilî nivisandina helbestan.

Yek jê lêkolîna li ser zar û peyvên kurdî yên ku ji çand û zimanê me hatine vedizîn, divê em li reseniya gotin û peyvên xwe bigerin û li zar û zimanê xwe vegeirînin. ■

تتمة المقال : آراء حول مهنة الطبيب والوضع الصحي في روژافا

ل. م يقول:

((في دكتور اطفال رخص المعاينة قام بعد شهرين سكر العيادة وما حدا فات لعنده والشعب عم يقول لو كان فيه خير ما كانت معاينته هيك رخيصة

في نوع من الشعب متعود يدفع مبالغ وماتقتنع بشي اسمه رمزي او مجاني مع العلم يوجد العديد من الأطباء لديهم يوم مجاني وعمليات مجانية

اتحدث قبل 2016 عندما كنت بقامشلو))

ر. ش يقول:

مع احترامي لكل بس يلي بشوفو انا اغلب الدكاترة بالبلد عم يعملو يلي عليهن واكثر

بالنسبة للاسعار بشوفا قليلة مو شي قدام الدولار واسعار السلع الاخرى

عملت عملية باقليم كوردستان لزوجتي (ولادة) 2015 كلفتني 1000 دولار

ساوينا عملية نأية بعدا 2017 عند دكتورة معروفة بالقامشلي كلفتني 100 دولار يمكن اقل كان ومشفى خاص

خلاصة الحكي انو الدكتور حقو للزلي بعد كل شي عملو ناهيك انو عم ينقذ ارواح بالاخير نجي نحاسبو ليش عم ياخذ 3 دولارات على المعاينة

بس في عندي ملاحظة دكاترة يلي السوريين يلي بالاقليم كوردستان بتلاقي قليل منون ببساعدو والبقية واسعارون خيالية ومافي مراعات ابدا

و يعتقد م. أ:

((انو المشكلة في نظام البلد نفسه حتى قبل الازمة وضعف الدخل لو كان في مراكز صحية متكاملة و متوفرة للجميع ما حدى كان راح يشتكى والاطباء في من جميع الاصناف وكل طبيب حسب تقديره والتعميم خاطئ في جميع الحالات ...))

و أنت عزيزي القارئ أين تكمن المشكلة برأيك؟ ■

أما ك. أ فيقول:

((ماضل شي على حالو و كل شي ارتفع بالليرة السورية أما عالدولار تقريبا نفس الشي و احيانا ارخص، متل معاينة الدكتور، يعني 500 ليرة تبع قبل الأحداث تعادل بسعر اليوم المسا 22300 ليرة.

المشكلة الأهم هي الوثوقية و خاصة في الأدوية و مواد مخابر التحاليل.))

وتقول م. س

((أنا اول سنة الاحداث نزلت على سوريا وعملت عملية لبنتي شلنا الاسنان الاربعة يلي قدام والسبب اني اعلم العملية في سوريا كان انه كانت العملية بالامارات راح تكلفني 16000 درهم ولما نزلت لسوريا يادوب كلفتني 1000 درهم مع اني عاجلت اسناني كان.

يعني هي المشكلة مو بتسعيرة الاطباء حسب اعتقادي

المشكلة بأن دخل المواطن قليل جداً سواء كان بيتقاضى راتبه من الحكومة او من الادارة الذاتية او كان عمل حر

لو قارنا الاسعار مع الخارج راح تطلع كثير عادية بس المشكلة هي مشكلة العملة والتضخم وانه الناس بتشوف الرقم كبير لانه رواتبهم لا تتناسب مع الحياة بأدنى مستوياتها

تصور معاش الموظف 20 دولار كيف راح يعيش هاد الانسان ويعيش عيلته

الموضوع مو موضوع دكاترة الموضوع موضوع البلد خربت))

ب. ل يقول:

((النظام الصحي بالكامل في حالة معاناة و اكثر من نص الشعب ما يقدر يوصل للخدمات الطبية المجانية بالشام او حتى بالمشفى الوطني بالقامشلي لاسباب معروفة و الاطباء كان انظمت و اكيد ما ألنا حق نخلي دكتور بديريك يشتغل معاينة بدولار واحد و زميلو براخو على بعد 40 كيلومتر معاينته ب 20 دولار مع العلم انو المصروف بكوردستان و القامشلي صاير قريب من بعض اذا استثنينا اجار البيوت مع فارق نوعية الحياة و بعدين حتى لو الدكتور اشتغل ببلاش هل مستودعات الادوية تقدر تقدم الدواء بالمجان و لا كلو بالدولار))

اولا انا ماني بسوريا... الحمد لله... و بنفس الوقت للاسف.

بس الاطباء الي هنيك كان بشر متلهن متل غيرهن...

بس سؤالنا... يا ريت كل الي لسا جوا البلد يحكونا... لساتكن عم تشتغلوا بنفس التسعيرة الي كنتوا تشتغلوا فيها قبل الاحداث... بدءا من بيع الخضرة و وصولا لاعلى الشهادات مع احترامي لكل مهنة...

يا ريت حدا من الي ما غلى تسعيرتو... او راتبو يشرف و يقلنا كيف عايش بهالظروف... مشان نقول لزملاءنا الاطباء الي بسوريا... عيب... شوفوا البقية ما غلوا...

ناظر جوابكن... و اتمنى يكون في كتير امثلة... و مو حالات شاذة و استثنائية))

وهذه بعض الآراء:

يقول هم:

((مشكلة مجتمعاتنا تسترخض العمل الذهني والعلمي لذلك بتشوف تعليقات انه دكتور معاينته 5 دقائق بياخد 5000 ليرة. طب ليش المريض ما بيروح عند حدا مو دكتور وخلي يعاينه ساعة كاملة ومعايش يعطيه خلال هالساعة 2500 ليرة!!!!

هي بالنسبة للتعليق على موضوع اسعار الاطباء سواء بالمعاينات او العمليات.

من ناحية الثانية هاد ما يبهر وجود فساد بالمجال الطبي متله متل اي مجال ثاني بسوريا سواء من ناحية التعاقد مع مخابر التحليل او الصيدليات مقابل ياخذ نسبة من اسعار الدوا و التحاليل (اذا كانت التحاليل فعلا ضرورية لا مشكلة بذلك هاد راح يعتبر امر تسويقي خاص بالطبيب والمخبر او اضافة تحاليل غير ضرورية او كتابة ادوية من صنف محدد لرغبة الصيدلي هون يعتبر فساد).

ويضاف الها موضوع المشافي وخدماتها (لما كنت بسوريا غالبا المشافي الخاصة كانت سيئة الخدمة واسعارها لا تتناسب مع الخدمة)

ونقطة اخيرة الاطباء الي بقوا صامدين بالبلد الله يقويهم ويوفقهم ووجودهم اكيد ساهم بانقاذ ارواح كتيرة))

آراء حول مهنة الطبيب والوضع الصحي في روژاڤا



تقرير: مجلة ولات

المواطن الروجافاوي يعيش في حالة عدم استقرار منذ بضع سنين ويعيش كل يوم تحت ضغوط الحياة المختلفة، و ربما لن يكون آخرها أزمة المياه التي ترافقت بانقطاع الكهرباء و ما ينجم عن هاتين المادتين الخدميتين من تبعات عديدة، أحدها انتشار الأمراض و خوف الناس من زيارة الطبيب بسبب غلاء المعاينة و التحاليل و الأدوية يعجز الكثير عن سدادها.

تختلف الآراء بين مؤيد لهكذا تسعيرة وبين معترض على إحدى مجموعات الفيسبوك طرح احد الاطباء المغتربين هذا السؤال:

((باعتبار انفتح موضوع الهجوم على الأطباء و اتهمهم بغياب الانسانية.

أعمل كشف اشعة على جيوبه قبل العملية



Du Helbestên T.S. Eliot



Wergêr: Şêrko Dakorî



T.S. Eliot (1888-1965) helbestvan, gotarnivîser, nivîserê şanogerî, û rexnegirekî Emerîkî-Britanî bû. Yek ji kesayetiyên herî xurt bû di wêjeya nûjen de. Eliot naskirî ye bi helbestên xwe yên mêtafîsîkî û giyanî û bi şano û gotarên xwe. Eliot di sala 1948an de xelata Nobelê wergirt.

Min ev du helbest ji dîwana T.S. Eliot a navdar *Four Quartets* (Çar Çarîne, ku di navbera 1936an û 1942an de hatin nivîsandin û weşandin) bijartine. Di helbesta yekê de Eliot behsa serdana xwe bo gundê East Coker li Ingeltrayê dike û ramanên ku bala wî mijûl kirin gava li nav gund û derdora wî digeriya. Di helbest dudwa de, ku devera "The Dry Salvages" di bala Eliot de bû gava nivîsî, ew ji Meryem diya Mesîh daxwaz dike ku ji bo deryavan û masîgiran lave bike, nemaze yên ku diçin û venagerin.

East Coker

I

Di destpêka min de dawîya min e. Li dû hev

Xanî ava dibin û dikevin, diherifin, tên firehkirin, rahiştin, hilweşandin, an dizgûnkirin, an jî li şûna wan

zeviyeke vekirî ye, kargehek e, yan derbasiyek e.

Kevirên kevn dibin avahiyên nû, hêzingên kevn dibin agirên nû,

Agirên kevn dibin arî, û arî dibe erd

Ku berê laş, pûrt, û pîsî ye,

Hestiyên mirov û lawiran e, pîkeyên genim û pelên daran e.

Xanî dijîn û dimrin: demek avakirinê heye

Û demek ji bo jiyanê û anîna zarokan heye

Û demek jî tê gava ba cama sist a pencereyê dişkîne

Û nixêva dîwar a ku mişkê bexçe tê de çargav dike, dihejîne

Û perdeyên riziya yê neqşek mit li ser dirûtî, dihejîne.

Di destpêka min de dawîya min e. Anha ronahî

Li seranserî zeviya vekirî dixê, û kolana kûr

Bi şaxên tarî li dû xwe girtî dihêle dema paşnîvro.

Tu xwe dispêrî ser kenarekê û erebeyek derbas dibe,

Û kolana kûr bi pelpkarî nîşanî aliyê

Gund dike, ku germa kehrebeyî

Ew bi magnetîzî nivandiye. Di mijeke tenik û germ de ronahiya şil

Tê vemijtin, ne şikandin, ji ser kevirên xwelîkî.

Gulên dalya di bêdengiya vala de razayî ne

Li bendî kundê zû.

Di wê zeviya vekirî de
Heger tu zêde nêzîk nebî, heger tu zêde
nêzîk nebî,
Nîvê şeveke havînî, tê dengê mûzîka
bilûra qels û dahola biçûk bibihîzî
Û tê wan bibînî çawa li dora êgir dîlanê dîkin
Balvedana mêr û jinê
Di semayê de, nîşana zewacê
Qurbaneke rûmetdar û fireh.
Du bi du, bi pêkvegirêdaneke pêwîst,
Bi dest an piyên hev girtine,
Ku nîşana lihevkerî ye. Li dora êgir digerin
Di ser pêtan re çeng dîkin, an digel hev in di cergeyan de,
Yan kenekî gundî dîkin
Pêyên giran di pêlavên gewc de hildidin,
Pêyine ji erdê, pêyine ji xîzê, bi kêfeke gundî bilind dibin,
Kêfa kesên ji zû de hatine binaxkirin,
Û ji genim re bûne tîmar. Ew bi demê re dilivin,
Li gor kêşê semaya xwe dîkin
Wek jiyana xwe ya li ser kêşên demsalên jîndar
Dema demsal û komstêran
Dema dotin û çinînê
Dema cotbûna mêr û jinan
Û ya lawiran. Pê blind dibin û dadikevin.
Xwarin û vexwarin. Peyîn û mirin.

Berbang nîşan dide, û rojeke nû
xwe ji bo germê û bédengiyê amade dike. Li ber deryayê,
bayê berbangê
ditewe û dihilise. Ez li vir im
An li wir im, an li çi cihê din im. Di destpêka xwe de me. ■

* * *

The Dry Salvages


IV

Xanimê, xwediya ziyareta li ser lata
beravî,
Lave bike ji bo hemû kesên di keştiyan
de, yên
Karê wan bi masiyan ve girêdayî ye, û
Ewên bi her veguestineke rewa mijûl in
Û her wiha yên wî karî bicih dîkin.

Laveyekê jî dubare bike ji dêvla
Jinên ku dîtine law û mêrên wan
Ketine rê û venageriyane:
Ey keça kurê xwe,
Şahjina bihiştê.

Laveyekê jî bibêje ji bo wan ên di
keştiyan de bûn, û
Geştê wan li nav xîzê bi dawî hat, di
lêvên deryayê de
Yan di qirika tarî de ya wan red nake
Yan li çi cihê ku
Zengilê deryayê nabihîzin gava
Limêja mizgîniya sermedî lê dide. ■

* * *



Bandora Sizayên Qeyser li ser Deverên Rojavayê Kurdistanê



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٧٥) ٢٠٢٠/٦/١ م